Sedat YURTDAŞ

ŞEVA WEQFA ŞİVAN PERWER
AN
PROVAYA VEGERÊ

14ê Sermawez (Mijdar) a ku bi 15ên Sermawezê ve hate girêdan, li Bonn'ê, liser gireke bilind, li 'Steinberger Grandhotel Petersberg'ê, -di heman wextî de mêvanxaneya Dewleta Fedaral a Elmanyayê ye-resepsiyona vekirina "Navanda Çanda Navneteweyî ya Weqfa Şivan Perwer" http://www.sp-f.org/lidar ket.

Steinberger Grandhotel/Petersberg

Hotelek, mîna ku di weneyê de xûya dibe, pir kevn û ewqas jî bi nav û deng e. Bi serê xwe, şahid û warê dîrokê ye. Bawer dikim di Çerxa Navîn de, mîna malikxaneyekê hatiye avakirin, lê di pêy sala 1830an re kirinehotel. Di panoya hundirê salona ketina hundir de, bi dehan fotografên mêvanan hatine bi cihkirin.

Ji Îngilistanê Qralîçe Elizabeht, Chamberlein,ji Sowyeta berê Brejnev, Gorbaçov, ji Navênda Afrika, Ji Etopya'yê Haile Selasiye, damezrînerê Tunisê Habib Burgiba, ji Serokê Amerîkayê berê Bill Clinton û gelek gelekên din. Ta avakirina Afganistan'a nû ya 2001'an jî di salonên Hotela Peterspergê de ava bûye.

Nîqaşên li ser cihên resepsiyonê têne bîra min. Bi rastî jî, Serxwebûnê lawê Şivan, belesebep bêyî tavîz nedigot: "Divê, em vekirinek bi her awayê xwe bi îhtîşam lidar bixin. Kurd jî, Fond jî û tu jî layîq î bavo!"

Bêşik, şevek welê bi îhtîşam bû, ku di derheqê şeve dê "Ji evdandûr nêzîkê Xwedê" hate nivîsin!

Ji gelek deverên Kurtdistanê, ji gelek welatên Ewropayê, ji kurdên Qazakistanê bigrin, heya nûnerên DTPê yê Şirnaxê Hasip Kaplan, ji nûnerên AKPê Amedê/Diyarbekirê, İhsan Arslan, Abdurrahman Kurt û nûnera Wanê Gülşen Orhan a ku di vekirina TRT-6'ê de, bi kilama 'Dotmam' ya Şivan Perwer beşdar bibû, hatibûn.

Gelek hundermendên Kurd ên dostên Şivan jî ew bi tenê nehiştibûn. Seydocan, Zinar Sozdar, Delil,Diyar,Rojan Delyar,Dez Deniz û Fatê..

Fatê û Dez Deniz

Şivan Perwer, di şevê axeftinek dirêj kir. Qala serpêhatiya hozaniya xwe, sirgûniya xwe, kilamên û mûziga xwe kir. Hêviya xwe ya vegerê careke din anî ziman.

“Lê divêhûnera min, kilamên min, naverok û maneya wan êdîbê nasîn. Lewre, ez di xizmeta gelê xwe de me. Divê vegera min jî li ser vê xizmetê bê ava kirin. Ji ber vê yekê, ez ne di derdê vegera xwe ya şexsî de me. Ez di derdê çareseriya mazlûmiya gelê xwe de me. Dema ez derketim her tişt qedexe bû. Lê vaye îro, gelek tişt bi gelek awayên xwe ve tê axaftin. Hêvî dikim ne ez bi tenê hemû sigûniyên Kurd bê fikar bikaribin vegerin welatê xwe. Pirsgirêkek me’ rakin. Em şer naxwazin, aşitî dixwazin. Em hunermend, amade ne xizmetê ji aşitiyê re bikin. Bipir di navbera gelan de. Em mîna gelekî azadiyê pirr dixwazin, ger me nexwestaya em nedihatin van rojan!”

Di şevê wekî din, li ser navê Kurdên Kazakistanê Mirzoyev Kinyaz İbrahîm, axifî. Ez bi naskirina wî gelek kêfxweş im. Ku ew, bi û bi nedamên malbata xwe ve, bi rastî dîrokek e. Pirtûka ku cenabê wî dîyariyê min kir,“Jiyan Di rêya Welatparizêyê Da” (Hejarê Şamîl/Medîna Knyaz) û min xwend. Divê, hîn gelek û gelek tişt li ser bêne nivîsin.

“Cihê Şivan Perwer dinava me Kurdên Sovyeta berê de ciheke pirr girîng e. Ev çil salin, em û zarokên me, bi kilamên wî mezin dibin. Wî, ruhek da me. Wî hêvî da me. Wî, nasnameya me pêşte bir. Wî, em bi çand û hûnera xwe, li ser piya hiştin. Em ji re gelek sipasdar in!”

Knyaz îbrahîm

Di pêy re Hasîp Kaplan axifî. “Hêza gelê Kurd nebûya, ger gelê Kurd li doza xwe xwedî derneketa û piştgirî nedana me, me ne duhî û ne jî îro dikarî bû, li Enqerê li Meclîsê dengê xwe bilind bikira û maf û azadiyên gelên Kurd biparastaya. Belê, mîna ku hate gotin, Şivan Perwer bi deng û mûziga xwe rengê xwe da gelê Kurd. Lê êdî divê, ew bibe mamosteyên mûzîknasan. Weqfa xwe mîna akademiyekê bikar bîne.”

Salona akûstik a şev lê lidar ket

Di pêy re Abdurahman Kurt bi Tirkî; “Em ewladê gelekî welê ne, ku tu demî alîgirrê xwîn û şer nebûye. Lê me her li ber zilmê li ber xwe da ye! Kurd wenda bikin, dê Tirk jî wenda bikin.”

İhsan Arslan jî, bi kurdî axaftinek dirêj kir: “Turkiye, ne ya du sal ürkiye 2 yıl önceki Türkiye değil" diyen AKP Milletvekili İhsan Arslan, "İnsanların 'Ne Mutlu Türküm diyene' demek zorunda bırakılmadığı bir Türkiye'ye doğru gidiyoruz” şeklinde konuştu.

“Tirkiye, êdî ne ya beriya bîst salan û ne ya beriya deh salan ne. Ne ya beriya sê mehan, ta ne ya beriya hefteyekê ye! Tirkiye gelek guherî, dê bigûhere. Dê hemû gelên kuli Tirkiyê dijîn û gelê Kurd dê bigihêje maf û azadiyan. Derdê me çareserkirina pirsgirêkan e. Derdê me, hembêz kirina gelan ne. Bila Kek Şivan bibore lê minew heya beriya kilama Helepçeyê nedinasî. Ez, bi gelek awayan hem bi erdnîgarî û hem jî bi felsefeya xwe ya îlmî ya hemû heyînên însanî ve dûr bûm. Lê mîna ku birêz Serokwezîrê me jî vegot. Kî dikare li ber kilama Hekepçeyê, bêhest bisekine!Em ber bi Tirkiyeyke ku dê tu kes mecbûrê gotinê nemîna ku, bêje ‘Ez çiqas bextewarim ku ez dibêjim ez Tirkim!’”

Divê naveberê de birêz Cengîz Çandar, li ba min car caran axaftin an rewşa li ber xwe didît, şîrove dikir.

“Tê fahm kirin, ku Şivan Perwer, di ava kirina nasnameya Kurdan de,cihê xwe yê ke gelek girîn heye” û di axaftina xwe de;

“Ez ji bo hezkirin û mûhabetta Kurdan her tiştî dikarim bikim. Ez mîna kesekî ji nivşên 68an ev 40 salin di nava Kurdan da me.Cara yekem, ji viya çil sal berê, min li Şamê Cigerxwîn li mala wî ziyaret kir û nas kir. Ji dema xwe ya Filîstînê vir ve ez ji aliyê mazlûma me. Ez xwe mîna dengê gelê Kurd ê yên însanî dihesibînim. Mîna peywirekê li ser milê xwe hîs dikim. Ji bo layiqê hezkirin û mûhabetta wan bibim her tiştî dikarim bikim. Tu carî îxanetê nakim. Lê divê, em li ber pêşveçûnan, bi xweşbîn bin. Li Hewlêrê, Li Kurdistana Iraqê hîkûmetek bi alaheye. Berê digotin Bakûrê Iraqê lê îro tê gotin Kurdistana Iraqê. Tiştên ku di 86 salan de nehat axaftin ev di navbera 3 meh û nivan de hate axaftin. Belê ji nivşên me gelek kesên cûda derketin. Jê hinek, nûha ji doza Ergenekonê têne darizandin û hepsê de ne. Jê hinek jî, hîn pênûsa xwe ji bona maf û azadiyan bikar tînin. Divê Şivan jî mîna vegera Silopî û Xabûrê bi mîlyonan were pêşwazî kirin!”

Di şevê de hevalê min û hemû Kurdên ku rêya di van 25 salên dawî bi Parîsê ketî, hevalên hemûyan, hempîşayê min Parêzar Kamûran Kîkî jî, mîna “talk-showmen”e kî serpêhatî û pekenokên xwe di her navberê de vegotin û geh em xemgîn kirin, mîna dema qala kuştina Serokê Partiya Demokrat a İranê Dr. Abdulrehman Qasimlo û hevalên wî, -divê ev mesele bi serê xwe û bi dorfirehî were nivîsin- , geh em kenandin.

Di pêy re Şivan Perwer’ê ku ev 35 salin li welatê xwe dûr dijî, -bi gotina Ahmet San: ‘Di dinê de çend Hûnermendên welê hene ku mecbûrê jiyana sirgûniyê bûne?!” derket ser sahneyê.

Çavên min jî mîna gelekên li cil û bergên Şivan yên neteweyî geriyan. Lê bi taxim û kravat bû. Bes mîna her dem bi saza xwe şeş têlî, hêdî hêdî dest pê kir û bi dengê xwe yê pak û zelal, bi dengê xwe yê xembar û serhildêr, bi dengê xwe yê xweş û hoste lorand. Li ber çavên me, ew gav bi gav vegûhezî, bû tişteke din. Bû efsaneyên sal û dewran. Dengê wî ge mîna çiyayê Agirî û Zaxros bilind bû, ge mîna deşta Mêrdîn û Herran û Misûlê nizim, ge mîna çemê Dicle û Firat û Minzûr bi coşek bêhampa herikî û herikî… Nûqûtî nava dilê me. Di hişê me de olan da. Di binhişê me de tofan çêkirin. Rengînêya welêt bi ser me de weşand. Eş û kûl û keder û hêvî û bihevrebûn di stranê xwe de stira. Şevek ku meriv di emrê xwe de , carekê dikare bijî, da jiyandin.



Ber bi dawiya şevê ve vê carê Gülşen'ê mîkrofon wergirt û gote: "Em jî Müksê bi kilamên te mezin bûn û me jî Kurditiya xwe bi te re nas kir"

Bi hevre kilama, "Dotmam" û "Ey Dilberê" xwendin.

Şev a vekirina Weqfê, ji aliyekê bûbû provaya vegerê, bi tevlêbûna hemû hûnermendan û dîlanan bi dawî bû.

21 Mijdar 2009 Amed syurtdas@yahoo.com